
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :854 11-Nîsan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165



# Dibe ku jiyana li cîhanê bi saya birûskan çêbûye



**Li gorî lêkolîneke dawî, bi saya birûskên bi milyonan salan dibe ku bingehê jiyanê li dinyayê çêbûbe.**

Li gorî lêkolîna hevpar ya Zanîngeha Yale ya Emerîka û Zanîngeha Leeds ya Ingilistanê, dibe ku birûskan rê li pêşiya jiyana li dinyayê vekiribe.

Li gorî lêkolînê bi saya birûskên bi milyonan salan re fosfor belav bûye û bi vê re jî biyomolekulên ji bo jiyanê pêk hatiye. Li gorî pisporan ev tişt tevkariyê li avabûna jiyana li dinyayê dike.

Çawa ku tê zanîn fosfor ya ku ji bo jiyanê pêwîst e, 4.5 milyar sal berê li dinyayê gelekî kêm bû û yek ji meraqan jî ev bû ku fosfor ya ji bo biyomolekûl û avabûna DNA'yê çawa hatiye bal hev. Tê diyarkirin ku ev tişt bi saya fosforê û mînerala bi navê schreîbersîte ya di nava wê de pêk hatiye.

Li gorî lêkolînê 3.5 û 4.5 milyar sal berê salê ji 100 milyonî heta milyarekê birûskan li dinyayê dida. Ev pêvajo bi qasî milyarek salan domiyaye.

Li gorî lêkolînên berê mînerala bi navê schreîbersîte ya ku çavkaniya fosforê ye meteorîtên ji fezayê ye. Di lêkolîna dawîn de tê diyarkirin ev meteroît têra evqasî fosforê nake ku jiyan pêk were. *ANF*

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | C | ■ | A | L | A | ■ | T | A | ■ |
| 2 | A | A | ■ | A | W | A | ■ | R | A |
| 3 | ■ | Ş | Î | V | ■ | B | E | G | ■ |
| 4 | S | ■ | S | A | K | O | ■ | O | F |
| 5 | Î | R | O | ■ | A | R | Î | ■ | E |
| 6 | ■ | E | T | Ê | ■ | Î | D | Î | R |
| 7 | Î | Ş | ■ | D | A | N | ■ | R | ■ |
| 8 | S | ■ | T | Î | ■ | A | L | A | L |
| 9 | A | J | O | ■ | A | S | A | ■ | I |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 5 | ■ | | | | | | | ■ | |
| 6 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 9 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |

ÇEP-RAST

1. Îşaret, şop... Encam, netîce
2. Xwarinên ji şîr
3. Cureyekî xwînê... Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov yan jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê)
4. Di Bektaşîtî û Mewlewîtiyê de birakê terîqetê... Baneşaneke gazîkirinê... Jan
5. Keça apê mirov
6. Daçekek ku wateyê xurt dike... Dijbera çepê
7. Beyreq, sembola welatan... Yezdanekî misrî
8. Cînava vegerok... Kurdistan li ser kîjan parzemînê ye
9. Notayek... Kar û xebat

JOR-JÊR

1. Kurtiya elementa Aktînyûmê... Daçekek
2. Celebek kaxiza nivîsê ku stûr e û rengê wê dişibe rengê kayê
3. Cejin, eyd... Tûj... Cure, celeb
4. (Rustemê …) Destaneke me... Cureyek seyê nêçîrê
5. Cînava pirjimariyê ya xwerû
6. Postê gurandî... Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê
7. Kevok... Gerstêrkek
8. Pirsek di rewşa tewandî de... Hewaya bêewr
9. Notayek... Kesê ku libat û tevgerên wî ji adet der in... Cihê hêranê

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Hevpar | Hevbeş, hevpişk, wekhev. Şirket, şerîke |
| Komele | Ciyê komekê ku ji bo armancekê bi hev re dixebitin. Rêxistin, organîzasyon, cemiye: Komeleya nivîskaran. Komeleya çandê... |
| Lîste (Îtalî) | Kaxiza ku navên çend kes yan tiştan li ser hev tê de hatine nivîsîn. Navnîş, damik, fihrist, katalog, endeks, tablo. Lîsteya xwarinê amade kir |
| Pozisyon (Fransî) | 1.rewş, hal. 2.cî, der, meqam. 3.pile, ast, derece, sewiye. 4.helwest, nêrîn. 5.awa |
| Rejim (Fransî) | 1.Pergal, sîstem, nîzam. 2.awayê meşandina dewletan |
| Sazî | Avayiya ku karê hevbeş lê tê kirin. Dezgeh, rêxistin, avayî, teşkîlat. |
| Sendîka (Fransî) | Yekîtiya pîşeyî, yekîtiya karkeran ya ku li hemberî xwediyên kar mafê wan diparêze. Nîqabe. |
| Sponsor (Ingilîzî) | Kesê, yan dezgeheke alîkariya diravî dide kesekî, yan dezgehekê. Piştgir. |
| Sosret | Bûyerên ne asayî, ezêb, xerîb: Tişta hatî serê me sosret bû. |
| Teror (Fransî) | Tirsandina bi kiryarên xerab, bi tayberî bi kuştinê |

## Tûrikê çîvanokan

*Di tûrikê me de îro çîvanoka li ser destar heye. Destar (gêreso) amûreke herî kevin yê hêranê ye. Berî ku aş çêbin mirovan zadê xwe bi destar dihêra. Li hin gundan niha jî şîş, savar û tiştên wisa bi destar dihêrin. Dema destar digerandin di ber re çîvanok jî digotin. Em binêrin ka li ser destar çi hatiye gotin.*

### DESTAR/GÊRESO



Bihêre destar hûr hûr bihêre
Savarê îsal wek zîv û zêr e
Destiyê destar ji darkenêr e
Bihara îsal tev xêr û bêr e
Zadê hêrayî tavêje jêre
Pîra serkofî savêr dihêre
Destaro destî darê goza ye
Girgirê kêmke pitik razaye
Dan û danhûrik ji hev cuda ye
Hinek jê şîş e hinek berba ye
Destî hinar e kevir ji deştê
Girrgira destar li min pir xweş tê



## Bi merasimeke girseyî şêniyên Efrînê 4 şehîd spartin axê

Şêniyên Efrînê cenazeyên 4 şervanên di qonaxa duduyan ya Berxwedana Serdemê de şehîd bûyîn, li goristana Şehîdan ya navçeya Ehdasê ya Şehba veşartin. *R-2*

## Parlamentara HDPê: Emê xebata xwe bi hêztir bikin û deskeftiyên xwe biparêzin



20ê Adarê bi biryara Erdogan, Tirkiyê bi fermî xwe ji Peymana Stenbolê ya parastina jinan ve kişand. Li dijî vê biryarê, li seranserê Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê jinan nerazîbûn da nîşandan. Jinan got ;" bi kişandina vê peymanê, zilam û zagon di bin yek sîwanê de wê sûcên xwe li dijî jinê bikin."..*R-3*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 854 11-Nîsan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## "Bi têkoşîna xwe emê tecrîdê bişkînin"



Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso: tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan tê kirin, li ser tevayiya gelan e.

RÛPEL-5

# PDK Û DAGÎRKER HEMAN KIRYAR



16ê Sibatê bi biryara dadgeha Hewlêrê, cezayê 6 salan li ser 5 rojnamevan û çalakvanên Bahdînan hat birîn. Li hemberî vê biryarê jî dîsa gel bi çalekiyan nerazîbûna xwe nîşan dide.R.4

## Pengava paqijiyê dest pêkir



Di dema qedexeya derketina ji derva, şaredarî valahiya taxan istixlal kir ku dest bi pengava paqijiyê bike. Di heman demê de ji bo ku hebûna erebeyan ne be asteng, şaredarî bi erebeyên agirkuj taxan bi avê temîz dike. . *R-4*

## Saziyên Fransayê: PKK'ê ji lîsteya terorê derxin



27 partî, komele, tevger û saziyên Fransa daxuyaniyeke hevpar dan û bang li hikumeta Fransa kirin ku PKK ji lîsteya terorê derxin û zordariya li ser Kurdan bi dawî bikin.. *R-4*

## Sûka berhemên jinê sûkek karsaziyê ye hewceyî piştgiriyê ye




Piştî derbasbûna demeke kurt li ser vekirina sûka berhemên jinê, tevî kêmbûna daxwaziya kirîn û firotina jî, jinên firoşgeh bi hêvî ne ku gel piştgiriya vê pirojeyê bike, da ku ew gavekê ji bo pêşketina jinan di warê aborî de bavêjin. . *R-3*

# Bi merasimeke girseyî şêniyên Efrînê 4 şehîd spartin axê

Şêniyên Efrînê cenazeyên 4 şervanên di qonaxa duduyan ya Berxwedana Serdemê de şehîd bûyîn, li goristana Şehîdan ya navçeya Ehdasê ya Şehba veşartin.





Bi sedan koçberên Efrînê û şêniyên kantona Şehbayê cenazeyên şehîdan; Reşîd Hesen (Bahoz), Xelîl Calo (Xabûr), Reşîd Xidir (Mezlûm Şêrawî) û Yaqûb Ozdeniz (Şervan Efrîn) ji nexweşxaneya Avrînê ya navçeya Fafînê girtin û bi karwanekî erebeyan ber bi goristana Şehîdan ya navçeya Ehdasê ve çûn.
Di merasima li goristanê de bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan endamê rêveber yê meclisê Hesen Berko axivî û ji malbatên Efrînê û malbatên şehîdan re sersaxî xwest.
Hesen Berko got, bi saya şehîdan meşeleya şoreş û berxwedanê wê heta serkeftin û xilasiya ji dagîrkeran pê xistî bimîne. Herwiha salvegera damezrandina YPJ`ê li gelê Kurd û rêber Abdullah Ocalan pîroz kir û rola YPJ’ê ya di têkbirina çeteyên DAIŞ’ê de destnîşan kir.
Endama rêveber ya Kongreya Star Mizgîn Ehmed jî axivî û soza şopandina riya şehîdan heta pêkanîna serkeftinê da û got, bi saya şehîdan meşeleya şoreş û berxwedanê wê heta serkeftin û xilasiya ji dagîrkeran pêketî bimîne.”
Piştî axaftin nasnameyên şehîdan hatin xwendin û radestî malbatan



hatin kirin.
Cenazeyên şehîdan di nava durişim û tilîliyên dayîkan de hatin veşartin.*ANHA*

## Di çalakiyên HRE yên dawî de 14 leşker û çete hatin kuştin

**Di çalakiyên Hêzên Rizgariya Efrînê yên ji 19’ê Adarê heta 7’ê Nîsanê de 9 leşkerên artêşa tirkî û 5 çete hatin kuştin, 12 çete û leşker jî birîndar bûn.**



Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) têkildarî çalakiyên xwe yên dawî yên li dijî artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê daxuyaniyeke nivîskî da.
HRE da xuyakirin ku di çalakiyên wan yên ji 19’ê Adarê heta 7’ê Nîsanê de 9 leşkerên artêşa tirkî û 5 çete hatine kuştin, herwiha 10 leşker û 2 çete jî birîndar bûne.
*ANHA*

## Li herêma Firatê ji 9’ê Nîsanê ve qedexeya giştî dest pê kiri ye

**Hevserokatiya Meclisa Rêveberi ya Herêma Firatê ragihand ku ji 9’ê Nîsanê ve qedexeya derketina derve ya giştî dest pê dike û wê 10 rojan dewam bike.**
Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Herêma Firatê li ser mijarê daxuyaniyek da.
Daxuyanî wiha ye:
“Ji ber derketina pêla sisiyan ya vîrûsa koronayê û tomarkirina kesên pêketî li herêma Firatê, em bang li welatiyên ku li herêmên Firatê dimînin dikin ku tedbîrên tenduristiyê yên şexsî pêk bînin (Maskan bi kar bînin, destan dezenfekte bikin, nêzî hev nebin..hwd).
Li gorî pêşniyarên Şaneya Aloziya Koronayê ya herêma Firatê em van biryaran digirin:
-Li seranserê herêma Firatê derketina giştî û çûnhatina di nava herêman de qedexe ye.
-Deverên giştî (Holên şahiya, cihên îbadetê, park, xwaringeh, kafeterya, klûbên werzişê, dikanên bazirganî û pîşesaziyê û dikanên cilûbergan) tên girtin.
- Ji bilî saziyên ku pêwîstiya bi karê rojane heye, xebat li saziyên Rêveberiya Xweser tê rawestandin.
Saziyên ku pêwîstiya wan bi kar heye ev in:
Desteya Tenduristiyê bi tevayiya ekîbên xwe.



Rêveberiya Herêmî û Jîngehê (Karkerên paqijkirin, av, rewşên awarte, aş, nan, muhtemedên nan, kehrebe û rêxistinên mirovî û geşkirinê).
Rêveberiya Sotemeniyê li gorî lîsteya nobetê li benzînxaneyê xebata xwe bidomîn.
Cotkar, xwediyên çêlekan, firoşkarên mast, penêr, firoşkên zebzeyan dikirin di saetên navbera 6 û 8 sibeha de karê xwe bikin
Çûn û derketin ji saet di navbera 5 û 7 ber êvarê de ye.
Têbinî: Tevger wê li gorî qedexeya qismî ya li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê be heta destpêkirina qedexeya giştî di 9’ê Nîsana 2021’ê de.”*ANHA*

## “Dewleta tirkî ji çeteyên Sûrî xwest ku ji bo şerê li Ukrayna amade bin”

**SOHR’ê eşkere kir ku istixbarata dewleta tirkî ferman da çeteyên bi navê “Artêşa Niştimanî ya Sûriyê” ku ji bo şerekî gengaz li Ukrayna amade bin.**
Li gorî çavkaniyên ji çeteyên girêdayî dewleta tirkî ya dagîrker, tevgera dewleta tirkî li gorî xwesteka ji Ukrayna hatiye. Ukrayna di dema civîna wan ya bi artêşa tirkî re ya hefteya borî de ev ji wan xwestiye. Li gorî heman çavakiyan di civînê de, istixbarata dewleta tirkî biryar daye ku gelek pêngavan pêk bînin û li gel Ukrayna bisekinin.
Çavkaniyekî nêzî çeteyan ji El-Nehar El-Arebiyê re got, piştî perspektîfên dewleta tirkî gihatin serçeteyan, wan jî lez da amadekariyê.
Çavkaniyê da zanîn ku navendên qeydkirinê yên nepenî, ji bo tomarkirina navên çeteyên ku dixwazin biçin Ukrayana hatin vekirin.
Li gorî agahiyan her çeteyê biçe Ukrayna wê mehê 4 hezar dolarên emerîkî bistîne û erkê wan çeteyan jî ew e ku li ser sînorê Ukraynayê ku di bin gefên Rûsyayê de ye, şer bikin.
Çavkaniyan eşkere kir ku li gorî girîngiya nakokiya Rûsya û Ukraynayê û xetera wê, karekî bi lez û bez ji bo şandina beşa yekê ya çeteyan ku ne kêmî 7 hezar çete bin, tê amadekirin da ku kengê were xwestin bişîne.
*ANHA*


## Deweriyeya 45an ya Rûsya û artêşa Tirkî li rojavayê Dirbêsiyê pêk hat

**Roja Pêncşemê polîsên leşkerî yên Rûsya û artêşa tirkî ya dagîrker li gundewarê rojavayê navçeya Dirbêsiyê dewriyeyeke hevbeş meşandin.**
Dewriyeya hevbeş ya Rûsya-dewleta tirkî ji deriyê Şêrik yê sînorî (13 km li rojavayê navenda navçeya Dirbêsiyê) dest pê kir. Dewriye ji 5 panzerên Rûsya, 4 panzerên dewleta tirkî û 2 helîkopterên Rûsyayê pêk dihat.
Dewriyeya hevbeş di gundên Şêrik, Delîk, Melêk, Bîrkinîs, Qêrewan, Zehir El-Ereb, Xezne, Îbrahîmiyê, Feqîre û Hilêwa yên rojavayê navçeya Dirbêsiyê re geriya.
Pişt re panzerên dagîrkeriya tirkî vegeriyan xaka Tirkiyê û panzerên Rûsya jî vegeriyan baregeha Rûsya ya li Qamişlo.
Ji dema imzekirina Peymana Soçiyê ve (22 Cotmeh 2019), ev dewriyeya 45an ya Rûsya û dewleta tirkî ya dagîrker e.*ANHA*



## Siyasetmedarê Kurd Yûsiv Dîbo jiyana koça dawî kir

**Siyasetmedarê Kurd Yûsiv Dîbo di 85 saliya xwe de di encama krîza dil de roja Pêncşemê jiyana xwe ji dest da. Dîbo ji şêniyên taxa Cemaya ya Qamişlo ye.**
Yûsiv Dîbo yek ji welatparêzên bakur û rojhilatê Sûriyê ye û jiyana xwe di siyasetê de derbas kir. Dîbo bavê endamê Meclisa Serokatiyê ya MSD’ê Sînhanok Dîbo ye.
Yûsiv Dîbo sala 1957’an tevlî tevgera siyasî bû û ji dema damezirandina Partiya Demokratîk Kurdistanî li Sûriyê tevlî bûye. Sala 1965’an jî tevlî Partiya Çepgir ya Kurdî bûye û sala 1989’an heta 1997’an sekreterê giştî ya partiyê bû.
Yûsiv Dîbo dawiya 1999’an ji ber nakokiyên di nivîsgeha siyasî ya



partiyê de derketîn, xwe ji kar kişand.
Li aliyekî din jî Dîbo sala 2015’an bû endamê payebilind yê PYD’ê.
Dîbo ji hêla hikumeta Şamê ve 6 caran hatiye girtin. Herwiha dadgeriya leşkerî ya Şamê sala 1974’an bi behaneya tevlîbûna li komeleyeke nepenî ji mafên sîvîltî bêpar kir.
*ANHA*



# “Şano dayîka huneran û neynika civakê ye”

Kawa Fetah şano bi`Dayîka huneran û neynika civakê`bi nav kir û got; “divê heskiriyên şanoyê gavên çalak biavêjin da rastiya heskirina xwe ya hunerê nîşan bidin.”



Mihrîcana 5`an ya Yekta Herekol ya Şanoyê 27`ê Adarê bi hilbijartina 9 şanoyan ji 23 şanoyan ji aliyê komîteya nirxandinê ve dest pê kir. Diviya 6`ê Nîsanê mihrîcan bi dawî bibe. Lê ji ber ragihandina qedexeyê 5ê mehê qediya.
Têkildarî nirxandina komîteya nirxandinê ya mihrîcanê, endamê komîteyê Kawa Fetah diyar kir ku şano li gorî pirrengiyê û erdnîgariya bakur û rojhilatê Sûriyê hatin hilbijartin.
Komîteyê bi vê yekê xwest ku derfet li pêşiya gelek berheman vekin ku nikarîn di mewsimên borî de tev lê bibin. Îsal ji komên şano ji Reqa û navçeya Til Koçerê beşdarî mihrîcanê bûn.
Mihrîcana îsal bi tevlêbûna tîmên jinan cuda bû. Du tîmên jinan yek girêdayî Kevana Zêrîn ku şanoya “Aştiya li ser baskên çûkan” pêşkêş kir û tîma Tolhildan Xweser ku şanoya “Qêrîn” pêşkêş kir.
Derbarê mijarê de Kawa Fetah diyar kir ku dozên civakî, azarên civakê ji ber şer û aloziyê, koçberî û guhertina demografîk ya ku li herêmên dagîrkirî diqewimin û rewşa koçberan di nava kampan de, bûn mijara şanoyan.



### QIRKIRINA ÇANDÊ

Her civak xwediya çandeke cuda ye û pê tê naskirin. Gelê Kurd jî ji gelên ku xwedî mîraseke çandî ya zengîn e. Lê desthilatan û kapîtalîzmê bi tevahiya rêbazan hewl dan çanda gelê Kurd tine bikin. Lewre çand nasname û hebûna her civakekê ye.
Ji ber wê di hinek aliyên bingehîyên çandê de mîna şano pêş neket. Lê gelê Kurd ji bo parastina şanoya kurdî li ber xwe da û hê jî di berxwedanê de bi israr e.
Fetah da xuyakirin ku şanoya kurdî xwedî girîngiyeke mezin û bondereke diyar li ser cîhanê ye. Fetah anî ziman ku derfetên kêm, dagîrkirina herêmên kurdî, qirkirina çanda kurdî ji aliyê pergalên desthilatdar ve roleke mezin di paşdemayîna hunera şanoyê de lîst.
Têkildarî asta şanoyên li bakur û rojhilatê Kurdistanê Fetah diyar kir ku her du jî bi rêya pêşxistina hunera derhêneriyê û nivîsandinê gelek pêşketî ne.
Fetah da zanîn ku li bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo pêşxistina şanoyê heta ku bigihîje asta cîhanê gelek xebat tê kirin. Fetah diyar kir ku Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol ji bo danasîna şanoya kurdî hatiye veqetandin û nîşaneya balkêşî û eleqedariya bi çanda kurdî re ye.
Fetah got, şano neynik û rengvedana çand û şaristaniya her civakê ye. Roleke girîng di parastina çand û dîrokê de dilîze.”

### REXNEYÊN WÊJEYÎ

Têkildarî nêrînên komîteya nirxandinê ku ji 6 endamên pispor û akademisyanên şanogerî pêk tê, Fetah diyar kir ku komîteyê şano bi rêya diyalog û peyamê wê, nirxand û wiha berdewam kir: “ Rola lîstikvanan de, dîkor, xebata hevbeş û derhêner jî di ber çavan re hat derbaskirin.”
Tê payîn ku komîteya nirxandinê civînekê bi tîmên şanoger re ku şano pêşkêş kirine lidar bixe da ku di demên pêş de şaşîtiyan derbas bikin û bi awayekî baştir şanoyan pêşkêş bike.
Kawa Fetah da zanîn ku divê girîngiyek ji şanoyê re were nîşandan, da ku bibe lêvegera nifşên paşrojê.
*ANHA*

## Film: Malava Analog
## Derhêner: Hîwa Amînnejad

Ev sînema nexweşiyeke bêeman e! Bi kî ve bizeliqe dev jê bernade û ew bi sêhra xwe mirovan di bin bandora xwe de dihêle. Kak Saîd jî bi kameraya xwe ya analog ji vê nexweşiyê para xwe têr girtiye. Piştî vê nexweşiyê ne şev jê re maye û ne jî roj. Jiyan lê herimiye! Ew bê kamera nikare bijî û sekn û tebat pê nakeve. Kak Saîd ewqas bi vê nexweşiyê ketiye ku ew dixwaze li camiyê filmekê nîşan bide û ji bo vê yekê gundiyan vedixwîne nîşandana filmê, lê ev daxwaza wî naçe serî û dawiyeke tahmsar li benda wî ye.
Li gundekî dûr yê Rojhilatê Kurdistanê kameraya Kak Saîd dibe çavê Kurdistanê. Çi dikeve ber kameraya wî ew digire û arşîv dike. Xweza, mirov, jiyana gundiyan û kesên temen dirêj yên ku li gundê wî ne. Li mala wî lodek bandên dîmenên ku wî ew girtine, hene û van bandan bi saya kurê xwe Dîyako diparêze.
Malava Analog, rêzgirtineke ji bo hêz û hezkirina li gel sînemayê. Kak Saîd wek Dzîga Vertov ê Rûsî, dibe mirovekî bi kamera û di rêçika Sîne-Çav a Vertov de dimeşe. Rastî çi be wê digire û dixwaze nîşanê me bide.
Film: 1001 Sêv
Derhêner: Taha Karîmî
Çend mirovên ku di gorên komî de nemirine û ji nû ve zîl dane, bi me re diaxivin. Bibîranîn û serpêhatiyên xwe yên dojehî dirijînin ber mirovahiyê. Ji mirinê mezintir û ji Enfalan bi hêztir in ew. Li rûyê me dinihêrin, li rûyê dinyayê dinihêrin û



dixwazin dengê dilê dinyayê bibîhizin. Ji lew re di dilê wan de 1001 birîn û çîrok hene. Di dilê wan de Enfalên xedar hene ku kêlên goran qet têra wan nakin. Lê çi ecêb e dîsa jî ew sêvên mîxekrêj bi riya çemê Dîcle dişînin Bexdayê. Li gel ewqas qirkirin û enfalan, ew aştiyê dixwazin. Dilê wan ji gorên komî mezintir e, hêviyên wan ji zilma zordaran bilindtir in.
Gelo çend sêvên mîxekrêj têra yên çûyî dikin? Enfal bi çend sêvên mîxekrêj tê jibîrkirin yan jî dermankirin? Me ne hewce ye hûn darên sêvan bixeritînin!? Ma ne hewce ye hûn darên dinyayê hemûyan biweşînin!?
Gelo çend sêvên mîxekrêj têra aştiya cîhanê dikin? Kêngî Kurd û dinya wê li hev werin?
Heger hûn li şûna Kurdan bûna, we yê çi bikira gelo?
*Yeni Ozgur Polîtîka*



## Dema Bêhna Nêrgizên Çiya Tê Min

**Sîpan Şînda**

Bihar bi hemî xeml û xêla xwe ve hêdî hêdî xwe berdide li çiya û baniyan, newal û geliyan, deşt û zozanan. Bihar, mizgîniya vejîna xwezayê ye, derbûna kanî û robaran e, dan dera berfîn û binefşan e, şînbûna canîmerg û nêrgizan, sosin û beybûna ye.
Mizgîniya biharê û xeml û xêla wê kulîlkên nazdar û jî kurt in. Belê kulîlkên biharê jî kurt in, lê ew her çend jî kurt in ji, keyfa ku mirov ji wan distîne bê hempa ye. Gelo çi tişt dikare wê keyfxweşiya ku dema çavên mirovî li canîmergekê, li binevşûkekê, li beybûnekê yan ji li nêrgizekê dikeve bide mirovî ji xeynê wê xeml û xêla biharê pêve…
Ew keyf û xweşiya mirov ji wê seht û gava kurt distîne…
Ew lehza ku mirov yazdeh mehan, çar demsalan li bendê dimîne…
Ew kulîlkên ku xwezayê dixemilînin, ew xeml û xêla ku dilê mirovî terr dike, rûyê mirovî geş dike, mirovî şad û sermest dike, ji xem û xeyalan û kul derdan dûr dixe…
Ew xeml û xêla ku kaniyên evînê der dike, zimanê şalûr û bilbilên lal bûyîn vedike, hêlîn û levdikan ji nû ve ava dike, jiyanê ji nû ve zindî dike…
Ax xecxecûkên kum sor û jî kurt! Ma bihar bê we dibe. Ew zeviyên ji kumê we sor dikin çiqasî bi xeml û rewş in…
Ew lîlozên çiyayê Cûdî û gulnixwîmên li çiyayê Simbilê û Zagrosê yên her tim bi hiznî û weke rondikên çavên bûkên ser bi xêlî nazenîn…
Nazenînin rondikên çavên bûkên ser bi xêlî, weke gulnixwîmên tenê li çiyayên poz bilind yên welatê birîndar şîn dibin…
Gelo çi derdê te heye ku tu tenê li çiyayên welatê dilkul û birîndar şîn dibî û te serê xwe nixwîm kirî ye…
Gelo çi li te qewimî ye te serê xwe tewandî…
Yan tu ji weke dayîkên welatê min dilkul û kezeb şewatî…
Yan ji tu rondikek ji çavên dayîka min î…
Lê ez dizanim, her çend te gula xwe sernixwîm ji kirî ye, tu ji weke dayîkên welatê min serbilindî û tu bi xeml û rewş î...
Lê bêhna biharê, nêrgizên çiya…
Ew nêrgizên ji latên asê bêhna xwe li ser gelî û newalan de berdidin…
Ew nêrgizên weke hêlîna teyrê baz, tenê di lat û zinarên asê de çêdibin û mirov nikare xwe bigihînê...
Gelo çi bêhn weke ya wan xweş e...
Na, ne misk û ne ji ember, ew bêhnxweştira hemiyane...
Dema mirov wan nêrgizên lata dide li ber bêhna xwe çi hizûrekê berdidin nava giyanê mirovî û mirov çiqes pê şad û sermest û geş dibe…
Belê xemla biharê, keyfa dilê yarê…
Ew yara xemla wê ji ya biharê, şewq rûyê wê ji ya wan kulîlkên jî kurt…
Ax bihara welatê min…
Ew çiyayên te yên hinde asê û poz bilind, di biharê de çiqas bi xeml û rewş û bi heybet in…
Na, xeml û xêla çi çiyan ne weke ya wan çiyayên pîroz in. Ew hizûr û dilgeşî, sebr û sebata ew çiyayên welatê min didine mirovî çi çiyayên din nikarin bidine. Ew bîna ku ji wan nêrgizên li lat û zinarên çiyayên Kurdistanê de şîn dibin difûre ji çi nêrgizan na fûre.
Belê xeml û xêla bihara welatê min e hizna dilê min dikuje û vediguherîne şahiyê…
Û xeml û rewşa bihara welatê min e derdike kaniyên dilê jiyanê...

# Pengava paqijiyê dest pêkir

Di dema qedexeya derketina ji derve, şaredarî valahiya taxan istixlal kir ku dest bi pengava paqijiyê bike. Di heman demê de ji bo ku hebûna erebeyan ne be asteng, şaredarî bi erebeyên agirkuj taxan bi avê temîz dike.

**Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo**



Cigerê şaredariya bajarê Qamişlo yê bi navê Nûrî Îbrahîm ev agahi dan: "Ev pengav ji demek de di pêlanên me de bû, lê derfet çê nedibû. Ji bo wê bi biryara qedexeya derketina ji derve, me wek derfet bi kar anî û me dest bi vê pengavê kir. Ev pêngave 5-6 rojan wê bidomîne"

Nûrî diyar kir di vê pêngava paqijiyê de, ewê gemara komkirî jî çareser bikin û ev pêngave wê belavbûna korona jî kêm bike.

Hevseroka şaredariya bajarê Qamilşo, Dîlan Hesî li sere mijarê agahî zêde kirin û wiha got: "Pengava me ji bo taxên sereke û bajêr e. Destpêkê de qonaxa şuştinê û dawî de jî qunaxa taqîmê(dezenfekte) ye. Herwiha komîtên me yên karên wan bi taybetî ji bo baqijkirina dibistanan hene. Lê li gor derfetên di destê me de, şaredarî bi tenê têrî nake. Ji bo wê me têkilî bi komîta tenduristî girêda ku ji bo dermanên paqijîyê alîkarbe. Di heman demê de me têkilî bi focên agirkuj jî kirîye ji bo paqijkirina taxan. "

Nêrînên gel

Şêneya bi navê Firyal Mihemed li ser vê pengavê wiha nêrînên xwe da: "pengav gavekî pir pîroz e û dibe alîkar bi gel re. Lê ta niha hin negihştine taxa me, dibe ku rojên bê pengava xwe bi temamî xelas bikin û ti tax bê



vî mafê paqijî nemînin."

Walatiyê bi navê Adil Ebas jî got: " li gor min ev pêngava pakijîyê, tenê bi şaredarîyê na gihe armanca xwe. Divê welatî tev bibin alîkar û ji malên xwe dest pê bikin. Herwiha di dema qedexeyê de, dikanên xwarin vekirîne, divê her roj werin temîzkirin. Lê mixabin em vê şêwazê bi kar naynin. Lê dîsa



jî ev pêngave hişmendiyekê paqijiyê ava dike û mirov dikare bi erênî binirxîne. "

# Li Nexweşxaneya Kobanê neştergeriya yekê ya dil

**Piştî 5 rojan ya vekirina beşa neştergeriyên dil, roja Pêncşemê neştergeriya yekê ya dil li Nexweşxaneya Kobanê bi serkeftî çêbû.**

Emeliyata dil ji jineke (54) ji Kobanê re bi çavdêriya bijîşkên pispor li beşa emeliyên dil (qestera) ya Nexweşxaneya Kobanê pêk hat û serkeftî bû.

Ji bo kêmkirina êşa nexweşan û lêçûnên tenduristiyê, Nexweşxaneya Kobanê cara yekê 3`yê Nîsanê bi piştgiriya Desteya Tenduristiyê ya Herêma Firatê beşa emeliyên dil vekir.

Têkildarî emeliya yekê Dr. Ehmed



Ewnî Bozan diyar kir ku emelî serkeftî bû. Nêzî saetek û nîvê dewam kir û bi çavdêriya kadroyên tenduristiyê yên wê beşê pêk hat. Dr. Ewnî da zanîn ku rewşa nexweş baş e û wê 24 saetan di bin çavdêriyê de bimîne.


Di beşa emeliyên dil de 4 bijîşkên nexweşiyên dil yên pispor û 10



hemşîre û alîkar dixebitin.

Kurê jina emeliya wê bûyî Ehmed Mistefa spasiya rêveberiya Nexweşxaneya Kobanê kir û got, nexweşxaneyê em ji zehmetiya rêwîtiyê xilas kirin û lêçûna emeliyê jî sivik kiriye.

Hêjayî gotinê ye ku emelî bi nîvê bihahê emeliyên li nexweşxaneyên



din yên bakur û rojhilatê Sûriyê ne.


Berî vekirina beşa emeliyên dil li Kobanê, nexweşan ji bo çêkirina emeliyan berê xwe dida herêmên din yên bakur û rojhilatê Sûriyê û ji ber wê pereyên zêde xerc dikirin û gelek zehmetî di rê de dikişandin.*ANHA*

# REWŞA DERMAN LI HERÊMÊ

**Serbest EHMED/Qamişlo**

**Bi girtina riyên di navbera bakur û rojhilatê Sûriyê û herêmên Hikumeta Şamê de, herwiha belavbûna û xeteriya vîrosa korona (covîd19) rewşa alavên tenduristî û jiyana xelkê bakur û rojhhilatê Sûriyê dixe xeterê de.**

**DIVÊ DERMANXAN E WERIN KONTROLKIRIN**




Têkildarê rewşa derman û alavên tenuristiyê, welatiyê bi navê Mihemed Etê axivî û wiha got; " Hemû pêwîstiyên me yên rojane, di rewşa aborî de bihayê wan bilind bû ne. Derman pêwîstiyeke cuda ye, Mirov nikare derman ne kire. Her çende ku bihayê derman li ser bakêtê tê nivisandin jî, lê bi sê qatan bihatir tê firotin. Li her dermanxaneyekê jî bi bihayekî cuda tê firotin. Hemû cureyên dermanan jî nayên bidestxistin. Xwediyê dermanxana û depoyan, dermanan vedişêrin û bi giranî difiroşin. Em hêvî dikin ku kontrol li ser wan were kirin û rê li pêşiya wan bê girtin û nehêlin pazirganiyê bi jiyan û tenduristiya mirovan bikin."

**DIJBERIYA XWE BI QUTKIRINA RIYAN DIDIN NÎŞANDAN**

Hevserokê Desteya Tenduristî ya Herêma Cizîrê Mustefa Keleş, derbarê mijara derman axivî û ev nirxandin kir ; "Ji ber rewşa aborî ya giştî li sûriyê û belavbûna korona ku xetereke mezin derxistiye holê, pirsgrêkên derman kurtir bû ne. Aliyên şerê sûriyê jî, ji bo berjewendiyên xwe hemû rê li ser herêmê qut kirine û rê nadin derman derbas bibe. Sedemên navxweyî jî hene; bihayê dolar bû sedama hin kesên bazirgan yên tinê berjewendiyên xwe diparêzin ji bo ku dermana bi giranî bifiroşin, dermanan di depoyan de vedişêrin."

**PROJE Û PLANÊN RÊVEBERIYA XWESER**



Mistefa Keleş axaftina xwe wiha domand :"Komîteyên me yên şopandinê hene, kontrola depo û dermanxaneyan dikin û di civînan de jî tên agahdarkirin ku rola xwe xurttir bikin. Bi armanca avakirina sîwaneke kar û kêmkirina bandora vê kirîz e, civîn li gel yekîtiya depoyên derman û yekîtiya dermanfiroşan tên kirin. herwiha Projeya avakirina kargeheke dermanan li herêma Cizîrê dest pê kiriye. Em bang li hikumet şamê û dewletên din dikin, ku derman û tenduritisya gelê herêmê weke amûrekî şer bi kar neîne."

Hêjayî gotinê ku ji 2020an ve, riya navneteweyî ya Til Koçer ya li gel Iraqê, ku tenê weke riyeke mirovî dihat bikaranîn, bi zora Rûsiya û Çînê hat girtin. Herwiha berjewendiyên aliyên navneteweyî dibin sedem ku Rêxistina Tenduristî ya Cîhanê, tenê bi wezareta tenuristiya Şamê re têkiliyan çê dike, ji bo ku Rêveberiya xweser ya ku 5 miliyon kesa rêve dibe, ji alikariyên wan bêpar bimînin. Alavên tenduristiyê jî yên taybet ji bo nexweşîya korona, ji Rêveberiay Xweser re nehatin pêşkêşkirin. Tenê 90 hezar parze(luqah) ji bo 5 miliyon mirova, ji aliyê hikumeta Şamê û Rêxistina Tenduristî ya Cîhanî wê were pêşkêşkirin.



## Xebata Kurdan li Ewropa: PENa KURD

**Derwêş M. Ferho**

Ji 1992 heta 2018, bê navber, her sal diçûm Gurcistan û Ermenîstan. Her sal jî min saziyên Kurdan li Gurcistan û Ermenîstan ziyaret dikir.

Li Gurcistan, Komeleya Kultûrî ya Kurdistan (vê dawiyê ji sedema zexta Turkiyê ji aliyê dewletê) hat girtin), navdarên Kurdên mîna Keremê Anqosî, Îsko Dasinî, Ando Çildergûşî, Nodar Mamreşî, Besa Caferova ziyaret dikir.

Li Ermenîstan R'ya Teze, Radyoya "Dengê Êrîvanê', Mala Kurdan, gundên mîna Elegez, Rêya Teze, Cumbuşvan, Mîrek, Senger, Şamîran … ciyên sereke bûn, min ziyaret dikir. Derfet pêk hat û me Hiseyn Cindoyan (yekemîn mamosteyê Kurd ku gelek ji şagirtên wî bûne nevdarên ji civaka Kurd li Kafkasê), Grîşayê Memê, Şakiroyê Xudo, Egîdê Cimo, Feyzo, Rizganê Recewî, Tosinê Reşîd, Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Karlanê Çeçan, Çerkezê Reş, Aslan Beg, Mahmud Beg dît. Mixabin çend kes ji wan di vê navberê de çûne ser dilovaniya xwe.

Li Êrîvanê Dengê Êrîvanê, bi salan e bi serkariya Keremê Seyad weşana xwe didomand. Yekemîn car ku ez çûme wira 1992 bû. Naverojekê çûm Radyo. Keremê Seyad û çend kesên din xizmet dikirin. Rewş baş nebû. Sovyet ji hev dihelweşiya, rewşa aborî xerab bû. Di nav derfetên dijawar de bûn. Xemgîniyek mezin di rûyê wan de xuya dikir.

Di 2005 de jî tev 32 xwendekar û ciwanên Kurd ji Ewropa me di çarçeweya projeyeke kultûrî de Dengê Êrîvanê (Radyo) ziyaret kir. Binevşa Bêrîvan wê demê ji bo filma xwe ya documenter bi navê Gelê Tawusî Melek (Traces: The people of Peacock) bi Keremê Seyad re hevpeyvînek dirêj kiribû. Mamoste bi berferehî ji komê re axaftibû.

Mamoste Keremê Seyad gelekî xemgîn bû. Di nav şert û mercên dijwar de kar dikir. Tenha mabû. Ez, cîgirê serokê Parlementoya Brukselê Jan Béghin û senator Hugo Van Rompaey (2005) çûn Radyo. Demek dirêj axaftin. Min jê re got ku berî hatina xwe me soza hevdîtin bi berpirsiyara karên gelên cuda li Ermenîstanê stendiye û roja din dive herin wê bibînin. Me bi hevra biryar stend ku ew jî bi me re were.

Roja din em bi hevra çûn wira û li ser pirsgirêkên Kurdan, rewşa Radyoyê axaftin. Di nav axaftina xwe de me ji xanima berpirsiyar re got ku di nav civaka Kurdên Ermenîstanê de dubendîtî peyda bû ye û beşek Kurdbûna xwe red dike, xwe wek gelekî din, wek "gelê Êzdî" bi nav dike. Ev jî dibe sedema parçebûna gelê me û ne ji bo Ermeniyan ne jî ji bo Kurdan tiştekî beş e. Me rica kir ku hikûmeta Ermenîstan di vê derbarê de hassas be û nexwaze Êzdiyan ji Kurdan biqetîne. Her tim xemgînî ji rûyê Keremê Seyad kêm nedibû. Bi taybetî dema behsa rewşenbîrên Kurd dibû. "Pirraniya rewşenbîrên me ji vira belav bûn. Kêm kes mane. Hinek çûn Ewropa, hin çûn Rusya, yê din çûn welatên din. Rewşa aborî em ji hev tert û bela kirin. Radyo li aliyekî, R'ya Teze li aliyê din bi derfetên xerab weşana xwe dikin. Ewê rojên pêş me çi şanî me bikin nizanim."

Kerêmê Seyad xizmetkarekî mezin bû. Di radyo de heta roja dawîn bi derfetên herî kêm de kar kir. Lê karê xwe berneda. Mîrasa rewşenbîrên mîna Casimê Celîl, Erebê Şemo, Qanatê Kurdo, Şekiroyê Xudo, Keremê Anqosî, Karlanê Çeçan, Ferîkê Usiv, Xelîlê Çeçan, Egîdê Cimo, …… bi xebta xwe, bi dengê xwe bi salan xwedî kir, jîndar kir. Lê mala xerîbiyê wêran bike. Ew jî ji nav me çû. Ewê her tim di bîra gelê Kurd de bimîne.



# Parlamentara HDPê: Emê xebata xwe bi hêztir bikin û deskeftiyên xwe biparêzin

20ê Adarê bi biryara Erdogan, Tirkiyê bi fermî xwe ji Peymana Stenbolê ya parastina jinan ve kişand. Li dijî vê biryarê, li seranserê Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê jinan nerazîbûn da nîşandan. Jinan got ;" bi kişandina vê peymanê, zilam û zagon di bin yek sîwanê de wê sûcên xwe li dijî jinê bikin."

**"KIŞANDINA JI PEYMANA STENBOLÊ XELEKA DAWÎ YE"**

Parlamentara Partiya Demokratîk Ya Gelan(HDP) Ayşe Acar, derbarê rewşa dawî û kişandina Tirkiyê ji Peymana Stenbolê axivî û ev nirxandin kir :"Ev demeke dirêje ku AKP-MHPê sûcan li dijî mafê mirovan û bi taybet jî li dîjî jinê pêk tîne. Dixwazin rola jinan di civakê de tine bikin û civakeke bi rengekî nijadperest û mêrane biafirînin. Ji 2015an ve şerê xwe li dijî jinan dijwartir kirine. Bi hezaran jin destgîr kirine û ji Hevserokatiya Şaredariya jî dûr xistine. Bi dehan rêxistinên jinan girtine. Di hikumeta xwe de jî, wezareta jinê hilweşandin e. Niha li dijî destkeftiyên jinan tev digerin û êrişên li ser HDPê jî bi heman armancî ne. Eger em bêjin kiryarên AKP-MHPê dijî jinan weke zincîrekê ye, kişandina ji peymana stenbolê xeleka dawî ye."

**"DIXWAZIN DESTKEFTIYÊ JINÊ TINE BIKIN "**

Ayşe axaftina xwe wiha dewam kir :"berîya kişandina peymanê jî ,sûc li hember jinê dihatin kirin. Lê bi kişandinê re hikumet pêşgiryê dide zilam û ji niha û şunve di




bin sîwana zagonê de, bê ku kes rêgiriyê lê bike wê sûcên xwe bike. Dixwazin destkeftiyên ku jinê bi xebata salane bi dest xistiye, bin pê bikin. Piştî nemana zagonekê jinê biparêze, sûc zêdetir bûne. Niha li Tirkiyê her 12 saetan, 6 jin tên kuştin. Armanca desthilatê ewe ku jineke lewaz û bê hêz ku her pêwîstiya wê di jiyanê de bi mêr hebe, biafirîne. Niha ne tenê hişmendiya desthilatdar ya zilam şerê jinê dike, zagon jî tevlî vê hişmendiyê bû."

**HDPÊ BI PÊŞNGTIYA JINÊ PERJEWENDIYÊN WAN TÊK DIDE**

Ayşe Herwiha got ;" HDPê di aliyê siyasî, mafê mirova û azadiya jinê de xebateke mezin dike. Pergal û projeyên HDPê perjewendiyên deshilatan dixe xeterê de. Xebata HDPê ya li dijî hişmendiya zilam ya hezarên salan têk dibe. Di partîya HDPê de, jin pêşeng e. HDPê ji wan re nîşan da ku cihê jinê ne tenê mal e, Jin dikare bajar û şaredariyan bi rêvebibe; Jin bi fikir û vîna xwe dikare civakê biguherîne û ji bindestiya hişmendîya koletî ya hezar salan derîne. Bi pêşengîya jin, HDPê li seranserê bakurê Kurdistanê gelek destkeftî û mafên jinê bi dest xistin. herwiha HDPê û gelê kurd bi pêşengtiya jinê têkoşîneke bêhempa dike û guhertineke dîrokî pêşxistîye. Lewra herku diçe, êrişên xwe li dijî HDPê dijwartir dikin. Bi êrişên xwe dixwazin HDPê û siyaseta hevserokatî tine bikin."

**"DURIŞMÊN EWROPA DEREWIN``**

Ayşe Acar, derbarê helwesta Yekîtiya Ewropa û civîna wan ya li gel Erdogan darxistî, wiha şirove kir:"Ji rengê û dîmenên civîna nûnerên Yekîtiya Ewropa li gel Erdogan diyar bû ku bêrêzî li himberî endama şandê ya jin hatibû kirin. Ewropa bi bertekên xwe yên şermoke dixwaze nîşan bide ku mafê jina diparêze. Lê ev kiryare hemû, li ber çavên wê tên kirin û niha jî, ji bo berjewendîyên xwe têkiliya li gel Tirkiyê xurtir dike. Em dikarin bêjin durişmên wê hemû `Derewin`."

**"ME XEBAT KIR, EM XEBAT DIKIN, EMÊ XEBAT BIKIN "**

Palamentara HDPê Ayşe Acar axaftina xwe wiha qedand : "Jin li himberî van kiryaran, helwestên xwe xurt dike. Li ser asteke bilind jinê xwe bi rêxistin kiri ye. Bi hemû hêza xwe xebateke bênavber li dijî sûc û biryara rakirina peymanê dewam dike. Em Biryara Erodgan qebûl nakin, peymana stenbolê destkeftekî jinan e."

# Sûka berhemên jinê sûkek karsaziyê ye hewceyî piştgiriyê ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Piştî derbasbûna demeke kurt li ser vekirina sûka berhemên jinê, tevî kêmbûna daxwaziya kirîn û firotina jî, jinên firoşgeh bi hêvî ne ku gel piştgiriya vê pirojeyê bike, da ku ew gavekê ji bo pêşketina jinan di warê aborî de bavêjin.**

Ji bo piştgiriya jinan di warê aborî de, 7ê Adara 2021 şaredariya kantona Qamişlo sûkek bi taybet ji bo berhemên jinê vekir. Sûk li taxa Erbe Şewari ya bajarê Qamişlo ye.

**PIŞTGIRIYA JINAN BIKIN DA KU ABORIYA XWE XURT BIKIN**

Sûk ji 14 dikana pêk tê. Dikanên cilûbergên Kurdî, karê destan, pêdeviyê paqişkirinê, bîhinênxweş û pirtûkxaneyek lê heye. Seatên kar ji nehê sibehan dest pê dike û heta çarê êvarî dewam dike.

Di destpêkê de Cîgira Ofîsa jinê ya desteya Şaredariyên herêma Cizîrê Bêrîvan Omer li ser sedemên vekirina vê pirojeyê axivî û dîyar kirk u ev du salin, ew amadekariya vekirina sûka berhemên jinê dikin. Armanca wan jê ewe ku, jinan teşwîq bikin ku têkevin bazara kar û aboriyê da hêza wan xurt bike. Ji aliyêdin jî derfetên jinên karker hindik e, ji ber wê ev piroje hat vekirin.

Di derbarê hilbijartina pêdeviyên ku li sûkê tên firotin Bêrîvan bi lêv kir ku ji bo kesên dixwazin bixebitin, wan ev piroje ragihand. Daxwaziya wan ew bû ku bi taybet karê destan bidin pêş, lê ji mafê firoşgeh jî heye ku tiştê bixwaze hilbijêre û bifiroşe.

Di dawiya axaftina xwe de Bêrîvan piştерast kir ku ew bi hevkariya Weqfa Ferensî alîkariya jinan kirin. Herwiha kirya dikanan jî sê mehan ji firoşgeha nayê girtin û




pişt re wê kiriya dikana 30 hezar lîreyên sûrî be.

**"FIKRA VEKIRINA SÛKA JINAN MIN JÊ HEZ KIR"**

Xwediya dikana cilûbergên Kurdî û dirûvan Mizgîn Ehmed kêfxweşiya xwe tîne ziman ku ji bo dirûtinê bikirên wê çêbûne.

Mizgîn diyar kir ku sedemê hilbijartina kar li vê sûkê ew bû ku sûkek bi taybet ji bo jinan hatibû vekirin û ji vê fikrê jî pir heskiriye. Herwiha ji bo alîkariya jinan jî bike, ew bi bihayekî kêm dirûtinê dike.

Di heman mijarê de Sena Şêxmûs ya ku pêdeviyên xwe dikirîn, ji me re axivî û bi lêv kir ku sedema hatina wê ya li vê sûkê ewe ku mereqa sûka jinê kiriye û bi vê yekê keyfxweş e. Heman demê de wê karê dirûtinê ecibandiye û dîyarkir ku bi bihayekî kêm cilûberg tên dirûntin.

Di dawiya axaftina xwe de Sena got ku ew piştgiriya sûkên wiha dike. Çimkê bi bihayekî kêm pêdeviyan difroşin û aboriya jinan jî xurt dibe.



## Rêber Apo heqîqeta me ye

**Gulîstan XALID**

Di mirov de herdem lêgera naskirina xwe û hawirdora xwe hebûye û ewê herdem jî hebe. Jiber zanebûn û keşifkirina heqîqeta rastiyan bê sînore. Rastî herdem hene, lê pênaseya ji rastiyan re dughere. Guhertina pênaseyan jî bi vebûna ufqên mirov û têgihiştina ku li gorî qanûnên gerdûnê, ne li gorî qanûnên ku bi aqlê mirov yê girêdayî berjewendî û hesabên teng ve dema ku pêşket, wê demê mirov nêzîkî heqîqetê dibe. Her rastiyek heqîqeteke xwe heye, lê heqîqeta her rastiyekê yeke, ew jî faamkirina qanênên xwezaya wê rastiyê û girêdaneke rast ya di navbera sedem û encamên hebûna wê de dana çêkirine. Her rastî çiqas li gorî xwezaya xwe tevbigere, an were bi tevger kirin, were pênase kirin ewqes dibe nêzî heqîqeta xwe. Weke mirov jî dema ku em li heqîqeta xwe digerin, vegera li kokê xwe, xwezaya xwe û jiyaneke li ser wî esasî dixwazin. Jiber sisteman, bîrdoziyan li gorî xwe an jî bi qasî têgihiştina xwe civakan înşa-ava dikin, lê di înşakirina civak û mirov de dema ku qalib an jî sînorên hişk hebin, ew dem xetimandin destpê dike, xetimandin jî dibe sedemên qawisan.


Ji rastiyên ku heqîqeta wê hatiye berovajî kirin û gelek leystok ji bo çewitkirina wê rastiyê di mejiyê mirovan de dana runişkandin jine. Jin rastiyeke, hebûneke, zindiyeke, lê heqîqeta vê hebûnê jin jî civak jî pêwîstiya wan ya şîrovekirineke di cih de hebûye. Weke jin em gelek bi şansin ku di serdema me de rêbereke xwedî lêgera heqîqetê û evîndarê azadiyê derket . Rêber Apo ji bo jinan û gelan riyeke nu nîşan da, pireke ji heqîqeta ku xwe pê bighîne rastiyê ava kir. Ew heqîqet jî nerîna ku pirsgirêkên azadiyê şîrove dike û mirovan dighîne sedemên rastî û dihêle ku encamên xurte jê derxîne. dema ku dibêje her mirovek gerdûneke biçûke, mirov çiqas rastiya vê gerdûna biçûk û tevgera wê nas bike, ewqes dikare sistema gerdûna mezin û wateya wê jî faam bike. Jiber mirov bi xwe jî parçeyeke xwezayê ye, xweza jî têkiliya di navbera hebûna me û jiyana li gorî xwezaya xwe ya azad ya ku zirarê nade ahengiya sistema gerdûnî îfade dike. Xwezaya azad, ya çêker, afrîner, avakre û herikbar.

Rêber Apo jî ew dîwarên ku li ser xwezaya mirov hatibû avakirin hilweşand. Di şexsê jin de, tevayî mirovatî di nava pencên desthilatdara de hatibû perpitandin, fetisandin û xetimandin . Rêber Apo, ew zexta desthilatdara ku li ser dînamîka herikbar û hêza hindirîn ya jin û civak hatibû ferzkirin, bi felsefeyeke ku mirova berbi heqîqetê ve dibe rakir. Jin çiqas hêza xwe nas dikin ewqes ji bo civakê jî dibine hêz, civak jî çiqas heqîqeta jin faam dikin ewqes herikbar û afrîner dibin.

Ji lewma her ku heqîqeta Rêber Apo jî ji aliyê jinan û gelan ve tê faam kirin, ewqes kêşer dibe. jiber rêber Apo heqîqet me û rastiya gerdûna hindirê mirov bixweye.

# REWŞA ROJNAMEVAN Û ÇALEKVANÊN BEHDÎNAN DI ZINADANÊN PDKÊ DE

Serbest EHMED/Qamişlo





**Tirmehê 2020an, ji ber qeyrana(kirîz) aborî li başurê Kurdistanê, çalakî li dijî PDKê hatin lidarxistin. PDKê bi hêzeke leşkerî êrişî çalakiyan kir û bi sedan çalakvan destgîr kirin. 16ê Sibatê, bi biryara dadgeha Hewlêrê, cezayê 6 salan li ser 5 rojnamevan û çalakvanên Bahdînan hat birîn. Li hemberî vê biryarê jî dîsa gel bi çalekiyan nerazîbûna xwe nîşan dide.**

Têkildarî kiryarên PDKê yên li dijî zagonên mafê mirovan, çalakvan Dîfa Herkî axivî û got; “Heta niha mafê serdanê ne dane malbat û parêzerên girtiyan. Derheqê wan de, tenê ji Komîteya Mafê Mirovan ya parlemanê başurê Kurdistanê ve agahî hatine girtin.”

**REWŞA DAWÎ YA ZINDANÊ**

Dîfa Herkî bal kişand ser şertûmercên girtiyan û wiha pêde çû; “Komîteya Mafê Mirovan rewşa wan ya li zindanê şopandibû û diyar kirbû ku 130 kes li hundirê yek odeyê de jiyan dikin, şertûmercên girtîgehê pir xirab in, ev yek bûye sedema têkçûna tenduristiya wan.”

Dîfa Herkî herwiha ev nirxandin kir: “PDKê rê nade ku li gel wan hevdîtin di çarçoveya mafê girtiyan de bên kirin. Di zindana Hewlêrê de Li dijî wan şereke derûnî tê kirin û pêwistiyên jiyanî ji wan re nayên pêşkêşkirin. Ev kiryar dermirovî ne, xeterê li ser jiyana wan çêdike.”

**“ROJNEMVAN DENGÊ GELÊ XWE NE”**

Herkî derbarê armanca PDKê de wiha got; “PDKê dixwaze rastiyan veşêre. Rastî ewe ku Hikumeta Başûr li dijî gelê herêmê tevdigere; Mûçeyên karmendên xwe nade, kesên ku hewl didin gendeliyê eşkera bikin, rastî kiriyarên wan yên dermirovî tên. Dixwaze gel bi destgîrkirinê bitirsîne. Ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj biparêze, amedeye li hember gel şêwaza ne mirovî bi kar bîne. Niha di zindanê de 75 çalakvan li benda biryara dadgehê ne. Ez jî yek ji wan kesa me ku biryara girtina min derketiye. Ji ber wê ez ji herêmên di bin kontrola PDKê de derketime. Karê rojnamevanan jî ewe ku van rastiyan eşkere bikin. Rojnamevanan destgîr dikin ta ku kiryarên wan yên li dijî gel, veşartî bimînin.”

**“PDKÊ ŞÊWAZÊN DAGÎRKERAN BI KAR TÎNE”**

Dîfa Herkî da zanîn ku, ew bi parêzer, çalakvan û rêxistinên mafên mirovan yên navneteweyî de, di têkiliya de ne û kiryarên PDKê ji cîhanê re, bi belge nîşan dikin û wiha bi dawî kirin; “Parêzerê çalekvan û rojnemevana, biryara Dadgeha Hewlêrê red kiriye û li Dadgeha Bilind ya Giliyan, dosiya vekiriye. Hêviya me ewe ku biryara Dadgeha Hewlêrê were hilweşandin û rojnamevan azad bibin. Kiryarên PDKê yên li dijî gelê başûr, kiryarên dagîrkeran e. Îran û Tirkiyê jî li dijî çalakvanên kurd heman sûcan dikin.”

## Ukrayna di navbêra Nala Rûsan û Bizmara Tirkiyê de....



Ednan Mustafa

Ne dûr e ku mirov bêje buyerên li seranserê Rojhilata Navîn tên jiyankirin, ji buyerên din yên cihanê qut in. Lewra dema em rewşa Rojava û Bakurê Sûrî binirxînin, divê em behsa hêzên navnetewî bikin. Di vê çarçoveyê de, ne şaşe ku em bêjin êrîşên duh li ser navenda Efrîna dagirkirî û lêdana balafirên Rûsî yên li gundewarê Idlibê girêdayî kirîza Ukrayna ne.

Li Herêma Efrîna dagirkirî û Idlibê tevgereke ne normal ya balafirên Şer heye. Li gor agahiyên ji herêmê tên û li gor malperên ser bi çeteyên Tirk ve balafirên li asîmana Efrîn û Idlibê yên Rûsiya yê ne. Di heman demê de malper û Steyên ser bi rêjîma Sûrî ve behsa derbasbûna balafirên şer û bêpîlot yên dagirkeriya Tirk li ser sînorê Efrîn û Şehab dikin. Bi vê mijarê ve girêdayî ev çend roji li malperên Çeteyên Tirk(artêşa azad) li beranberî 1000 Dolarî deng û bangawaziyên ji bo çûna şerê Ukrayna tê kirin.


Ukrayna di salên dawî de bi baldariyeke mezin têkiliyên xwe û Tirkiyê dişopîne. Bi taybet piştî 2014an ku Rûsiya herêma Kirimê ya Ukrayna desteser kir, hîn zêde Ukrayna ket nav hewldana pêşxistina têkiliyan bi Tirkiyê re.

Di vê çarçoveyê de hevkariya di navbera Tirkiyê û Ukrayna de asta du welatên cîran yên hêrêm derbaskiriye. Çawa Tirkiyê li Ezerbeycan, Qibris û Başûrê Kurdistanê weke herêmeke ya xwe dinêre, wisa li Ukrayna jî dinêre. Ji ber vê yekê ne tiştekî Sûsrete ku Tirkiyê çeteyên bi kirê yên li Sûriyê bişîne Ukrayna bi navê parastina umeta îslamê. Helebet ev têkiliya Tirkiyê ne têkiliyeke rojane û bercewendiyên demkî ne. Di navbêra herdu welatan de, hevkariyek Aborî, Leşkerî û Parastinê vedigre demeke kevin. Lê ji ber bercewendiyên herdu aliyan û bi taybet Tirkiyê divê demê de ev hevkarî lezkir û piştgiriya ji Ukrayna re nîşan da. Sedema vê yekê vedigere têkliyên di navbera Rûsiya û Tirkiyê yên di van demên dawiyê de bi aloz. Bi taybet rawastandina bernameya S400 ji aliyê Tirkiyê de û girêka Idlibê bi piştgiriya AKP ê û MHP’ê ji komên tundrew re, hesabê Rûsiya yên li Sûriyê serûbinî kir. Lewra Tirkiyê dixwezê qezencên xwe yên li Sûriyê û zerara xwe ya S400 bi aloziya li Ukrayna mayende bike û helwesta Rûsiya di serî de li cimhuriyetên Suveyta kevin lewaz bike û di qada navnetewî de Rûsiya bê hewlest bihêle. Tirkiyê bi vê polîtikaya xwe, weke meymonê li ser sê kêndiran dilîze, hem xwe ji berçavên raya giştî paqij û piştgirê mirovahiyî derbixîne, hem jî zexteke siyasî û diplomatî li ser Rûsiya bimeşîne. Weke ku alikariya gelê Ukranî dike, Muslimanên li Ukrayna di xeteriyê de û bi hawara wê ve diçe nişan dide.

Di vê çarçovê de, di rojên pêş de, ji Ukrayna bêhtir wê nakokiyên Rûs û Tirkî li Sûrî û Rojavayê Kurdistanê zêde derkevin pêş. Şer û pevçûn li herêmên weke Idlib, Bab û xeta Ezaz wê zêde bibe. Çareserkirina aloziya herêmên dagirkirî, li ser du bazaran di navbera herdu aliyan de angu Rûs- Tirkî radiweste. Tirkiyê, Ukrayna ji tasrifa Rûsiya re bihêle, li hember vê yekê jî Rûs hewldanên êrîşan li ser Idlib bide seknadin û rê nede Hêzên Rizgariya Efrînê ku çalakiyan li Efrîna dagirkirî pêş bixe.

# Saziyên Fransayê: PKK’ê ji lîsteya terorê derxin

**27 partî, komele, tevger û saziyên Fransa daxuyaniyeke hevpar dan û bang li hikumeta Fransa kirin ku PKK ji lîsteya terorê derxin û zordariya li ser Kurdan bi dawî bikin.**



Kurdan yên li Fransa serdegirtin hatin kirin û hat gotin, ev rewşeke sosret e. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku operasyonên ku gelek endamên saziyên Kurdan hatin destgîrkirin, di demekê de hat kirin ku Erdogan bi her awayî mafên mirovan û azadiyê binpê dike. Herwiha hat bîrxistin ku di vê demê de rejima Erdogan

Gelek partiyên çep û sendîka, tevgerên siyasî, komele û komên dostayiya bi Kurdan re jî di navê de 27 saziyan bi sernavê “Divê bêwijdaniya li Fransa ya li dijî Kurdan bi dawî bibe” daxuyaniyeke hevpar weşandin.

Di daxuyaniyê de hat bibîrxistin, ku di demekê de ku Yekîtiya Ewropa rewşa Tirkiyeyê meha Hezîranê xist bin kontrolê, hefteyên derbasbûyî li dijî saziyên

hewl dide HDP’ê ya ku dengê 6 milyon kesî girtiye qedexe bike. Di daxuyaniyê de hat bîrxistin ku Kurdan li Rojava tevî Fransa bi welatên din yên koalisyona navneteweyî re li dijî çeteyên DAIŞ’ê têkoşîneke meşandine, lê belê îro li dijî wan helwesteke neyînî heye.

**‘BILA PKK JI LÎSTEYA TERORÊ BÊ DERXISTIN’**

Saziyên Fransayê diyar kirin ku di heman demê de li girtîgehên Tirkiyê bi hezaran girtiyên siyasî bi sûcdariya ‘terorîzmê’ tên girtIn û ji bo PKK’ê bang li Yekîtiya Ewropa û Fransa kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin, “Dem hatiye ku PKK ji lîsteya rêxistinên terorê bê derxistin” biryara Dîwana Edaletê ya Ewropa hat bibîrxistin ku 15’ê Mijdara 2018’an qedexeya li ser PKK’ê hiqûqî nedîtiye. Saziyan hişyarî dan ku Ewropa û Fransa xwe bi vî rengî li pêşberî qanûnan dixIN pozisyoneke derveyî hiqûqê.

Saziyan xwest dawî li şopandina Kurdên li Ewropa û Fransa bê anîn û êdî nebin hevparê polîtîkayên rejima Erdogan. Di daxuyaniyê de herî dawî bang hat kirin ku nirxên mirovî beriya her tiştî bin û dawî li tundî û bêedaletiyê bê anîn.*ANHA*

# Qebîleya Fedan li dijî êrişên dewleta tirkî banga hevgirtinê kir

**Têkildarî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmê û rêbazên rabûna li hemberî van êrişan, şêx û rûspiyên qebîleya Fedan ya Ereb li Eyn Îsa civiyan.**

Civîn li gundê Hedla yê 20 km. li rojavayê navçeya Eyn Îsa bi beşdarbûna bi dehan şêx û rûspiyên eşîra Fedan, Hevserokê Nivîsgeha Têkiliyan ya PYD’ê ya kantona Girê Spî Mistefa Muslim, Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid û Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Girê Spî Riyad El-Xelef hat lidarxistin.

Civîn bi axaftina Hevserokê Nivîsgeha Têkiliyan ya PYD’ê Mistefa Muslim dest pê kir. Muslim got, gelek mijar hene divê em li ser bisekinin û her tişta girêdayî herêmê, di serî de êrişên ser herêmê ne.”

Mistefa Muslim bal kişand ser pêşdîtinên rêber Abdullah Ocalan yên derbarê şoreşên gelan de û got, sala 2004’an, rêber Abdullah Ocalan gotibû wê şoreşên gel li dar bikevin. Berî 2020’an bihara ereban dest pê kir ku bû şoreşa tevayiya gelên herêmê.” Muslim got, di şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi saya hevgirtina pêkhateyan û şopandina xeta neteweya demokratîk û biratiyan gelan gelek destkeftî bi dest xistin.

Beşdaran li ser geşedanên li herêmê û navçeya Eyn Îsa bi taybetî nêrînên xwe parve kirin. Piraniya şêx û rûspiyan banga hevgirtinê li hemberî êrişên li



ser herêmê kirin.

Li ser mijarê, Berdevkê Fermî yê Meclisa Şêwirî ya Qebîleya Fedan Teysîr El-Efat axivî û got, ev civîn ji bo qebîle û herêmê û ji bo biratiya gelan e. Em li vir in da ku bi rêveberiya heyî ya li herêmê re koordîne bikin. Emê li ser êrişên li dijî herêmê nîqaş bikin. Lewre rewş me hemûyan eleqedar dike. Em êrişên dewleta tirkî yan dewleteke din li ser herêmên me red dikin.



# “BI TÊKOŞÎNA XWE EMÊ TECRÎDÊ BIŞKÎNIN”

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso: tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan tê kirin, li ser tevayiya gelan e.

Darîn Silê/Qamişlo




Xerîp Hiso bi bîr anî ku Rêber Apo jî dibêje ‘bi milyonan insan di nava tecrîdê de jiyan dikin’ û wiha pêda çû; “Ji ber vê jî em tev di tecrîdê de ne. Ji bo ku em karibin vê tecrîdê bişkînin têkoşîn û rêxistikirin pêwîst e.”

Xerîb Hiso banga xurtkirina têkoşînê kir û got; “Divê em bi têkoşîna xwe faşîzmê bişkînin, çimkî roxandina faşîzmê roxandin tecrîdê ye. Aloziyên ku rojhilata navîn têde jiyan dike, tecrîda herî giran e. Dewletên desthiladar ji bo ku berjewendiyên xwe li ser xaka me pêk bînin, civak ji civakbûnê, mirov ji mirovatîyê dûr xistine û heskirina ax, welat û xwezayê ji dilê mirovan qut kirine. Herwiha Ji bo berjewendiyên xwe siyaseteke qirêj didin meşandin. Dewletên navneteweyî di tecrîda girankirî ya li ser Rêbertî de şirîkin. Mafê her kesê di zindanê de heye ku hevdîtin û têkîliyên xwe bi yên derve re bike.”

**“EMÊ RÊBERÊ XWE JI TECRÎDÊ AZAD BIKIN”**

Xerîb da zanîn ku gelê kurd bi hêz û baweriyên rêber Apo jiyan dikin û axaftina xwe wiha dewam kir; “Rêber Apo civakak bi hêz ava kir. Gavên ku rêber Apo bi berxwedan dest pê kirin, emê berdewam bikin. Fikir û ramanê Rêbertî ne tenê di nava gelê kurd de, di nava tevayiya pêkhateyan de belav bûye. Gelê kurd, îro roj bi roj bi hêza rêbertî û bi xwîna şehîdan gavên mezin avêtine û di nava cîhanê de bûye xwedî hêz. Ji bo wê wek gelê kurd divê em li reberê xwe xwedî derkevin û bi têkoşînê rêberê xwe azad bikin. Çawa ku rêber Apo me ji tariyê anî ronayiyê, emê jî wî ji tecrîdê azad bikin. Da ku em jiyaneke azad bi rêber Apo re jiyan bikin.”

Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso da xuyakirin ku dewleta tirkî ne tenê rêber Apo, gelê kurd hedef digre û axaftina xwe wiha bi dawî kir; “dewleta tirkî dizwaze gel û rêbertî ji hev qut bike, çimkî baş dizane ku rêbertî hêzeke mezin daye kurdan. Lê ti caran em ji rêberê xwe qut nabin. Rêbertî bandorekî xwe yê mezin li ser civakê heye,



bi taybetî civaka kurd. Dewleta tirkî hemî hewildanên xwe bi kar tîne ji bo ku hêza kurdan lewaz bike. Bi ramanê rêber Apo şoreşek hatiye lidarxistin û ev sores wê dewam bike.”

# Desteya Tenduristiyê: Divê gelê me li gorî tedbîrên xweparastina ji koronayê tev bigere



**Berdevka fermî ya Desteya Tenduristiyê ya herêma Cizîrê Rojîn Ehmed bang li welatiyan kir ku tedbîrên xweparastina ji vîrûsa korona pêk bînin. Herwiha da zanîn ku pêla sisiyan ya vîrusê bixeter e û bilez belav dibe.**

Ji ber pirbûna pêketiyên vîrûsa Korona Rêveberiya Xweser qedexeya derketina derve ya giştî li ser Qamişlo, Hesekê û Reqa danî. Herwiha qedexeya beşî jî li tevayiya herêmên din danî û ji 6’ê Nîsanê ve vê biryarê dest pê kiriye.

Têkildarî qedexeyê berdevka Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê Rojîn Ehmed ev agahî dan: “Di vê dema dawî de, bîlançoya pêketî û miriyên vîrûsa Korona zêde dibin. LI Qamişlo rojê 80 kes pê diketin û gelek jî dimirin. Desteya Tenduristiyê ji bo pêşî li belavbûna vîrûsê bigire, careke din qedexeya derketina derve danî.”

Rojîn Ehmed axaftina xwe wiha domand: “Sedema ku careke din vîrûs li herêmê belav bûye, derketina pêla sisiyan ya vîrusa Korona, xetera wê û lezbûna belavbûna wê di navbera çîna ciwan de ye.”

Rojîn Ehmed derbarê dema qedexeyê de, ev agahî da: “Biryar, wê li gorî kesên ku rojane pê dikevin were standin. Lê belê eger jimara nexweşan zêde bibe, wê yekser Şaneya Aloziyê dema qedexeyê dirêj bike û tedbîrên guncaw bigire.”

Li herêmên bakur û Rojhilatê Sûriyê jimara giştî ya pêketiyên vîrûsa Korona 10 hezar û 404 e, jê 389 mirine û hezar 327 baş bûne.

*ANHA*

# Li Metîna û Bagokê 7 gerîla şehîd bûn

**HPG’ê ragihand ku li Metîna 5’ê Nîsanê gerîlayek û 29’ê Adarê li herêma Bagokê ya Mêrdînê jî 6 gerîla şehîd bûne.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê da xuyakirin ku li Bagokê di operasyona leşkerî û bombebarana 2 rojan de 6 gerîla şehîd bûne. Herwiha 5’ê Nîsanê jî gerîlayek li herêma Metîna di bombebaranê de şehîd bûye.

HPG’ê di daxuyaniyê de ev agahî dan: “29’ê Adarê li qada Kela Şehîdan ya herêma Bagokê ya eyaleta Mêrdînê, li dijî komek hevriyên me, artêşa tirkî ya dagîrker dest bi operasyonê kir. Dagîrkeran bi balafirên şer sê saetan bombe li qadê barandin û pişt re bi helîkopteran qad bombe kirin, leşker danîn herêmê. Di vê operasyona ku du rojan dewam kirî de, hevriyên me Hewram, Rustem, Egîd, Rêber û Serhed û welatparêzekî me yê bi navê Hakî di şer û bombebaranê de şehîd bûn. Agahiyên li ser nasnameya şehîdên me piştî ku eşkere bûn



wê bi gelê me û raya giştî re bên parvekirin.”

HPG’ê ragihand ku 5’ê Nîsanê li qada Tepê Ortê yê herêma Metîna di encama bombebaranê de gerîlayek şehîd bû. Nasnameya gerîlayê şehîd wiah ye:

Nasnav: Mervan Gabar. Nav û paşnav: Yûnis Ozata. Cihê jidayikbûnê: Qereyazî. Dayik û bav: Şerefnaz-Seyît Batal. Dem û cihê şehadetê: 5’ê Nîsana 2021 / Metîna

HPG’ê ji malbatên şehîdan û gelê Kurdistanê yê welatparêz re sersaxî xwest.


# KONGRA-GEL: Rûyê rast yê Konseya Ewropa û Yekîtiya Ewropa dîsa eşkere bû

**KONGRA-GEL têkildarî serdana rayedarên Yekîtiya Ewropa ya Tirkiyê daxuyaniyek da û diyar kir ku sûcên li dijî mafên mirovan yên li Tirkiyê ne li xema Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropa ne. Berjewendiyên wan di ser her tiştî re ne û vê, rûyê rast yê wan dîsa raxist ber çavan.**

Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA-GEL daxuyaniyek weşand û bal kişand ser serdana seroka Komisyona Yekîtiya Ewropa (YE) Ursula von der Leyen û serokê Konseya Ewropa Charles Michel ya Tirkiyê.

KONGRA-GEL di daxuyaniya xwe de wiha got:

“Weke ku di daxuyaniyan de jî hat dîtin, li Tirkiyê mafên mirovan, demokrasî, qeyûm, pirsgirêka kurdî, doza girtina HDP’ê, daxwaziya bêdengkirina muxalefetê, vekişîna ji Peymana Stenbolê,



komkujiyên jinan, xizanî, xwekuştin, bi dehhezaran girtiyên siyasî ne li xema Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropa ne. Berjewendiyên aboriyê yên her du aliyan di ser her tiştî re ne û vê, rûyê rast yê Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropa careke din raxistiye ber çavan.

Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropa, binpêkirina pîvanên demokrasiyê û mafên mirovan yên gerdûnî ji aliyê desthilatdariya AKP’ê ve, polîtîkayên wê yên li dijî mûxalîfan û bi taybetî jî li dijî Kurdan ji nedîtî ve hatiye. Ev toleransa mezin ya ku nîşanî Erdogan dane, sedema bingehî ya dewamkirina şerê taybet yê AKP-MHP’ê yê li dijî Kurdan e. Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropa bi vî rengî bûne hevparên sûcên tifaqa AKP-MHP’ê.

CPT di rapora xwe ya berî niha de ya li ser Îmralî ragihandibû ku binpêkirinên mafên mirovan yên giran hene. CPT tevî ku 11-25’ê Çileya 2021’î serdana Tirkiyê kir neçû girava Îmralî û pirsgirêkên di rapora xwe de ragihandîn kontrol nekirin. Ev jî polîtîkaya durû ya Konseya Ewropa ya li ser pirsgirêka Kurd nîşan dide.

Yekîtiya Ewropa bi bêdengiya li pêşberî dagîrkeriya dewleta tirkî ya li Efrînê bûye hevpara sûcên li Efrînê yên guhertina demografiyê, destavêtin, komkujî, revandin û kuştina mirovan, firotina jinên revandî li Qeter û welatên din yên erebî.”

# Çalakgerên greva birçîbûnê bi biryardarî çalakiya xwe didomînin

**Çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo azadiya rêber Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan li dijî girtiyan, li girtîgehan, Mexmûr û Yewnanistanê bi biryardariyeke xurt dewam dikin.**

**ZÎNDAN**

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîdê û azadiya rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariya li girtîgehan ku 27`ê Mijdarê ji aliyê gitiyên ji doza PKK û PJAK’ê ve hatibû destpêkirin, ev 136 roj in dewam dike.

**MEXMÛR**

Li Wargeha Koçberan ya Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jî li dijî tecrîda li Îmralî, bi pêşengiya jinan 18’ê Kanûnê çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakî li Komeleya Malbatên Şehîdan di roja 115an de dewam dike.

**YEWNANISTAN**

Welatiyên li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê jî, ji bo bi dawîkirina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û xwedîderketina li çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dest pê kiriye, bi israr çalakiya xwe didomînin.

Çalakiya ku bi pêşengtiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ) Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê hatiye destpêkirin, di roja 98`emîn de dewam dike.

*ANHA*